FOLKHÄLSOMYNDIGHETEN 2015

Folkhälsomyndigheten

LÄKEMEDELSVERKET
MEDICAL PRODUCTS AGENCY

Nameyeke agahiyê ji bo xwediyê dikanên ku bîraya gel (folköl), tûtin û dermanên bêreçete difiroşin. Di nameyê de tê diyar kirin ka kirîna kontrolê çi ye û ku şaredarî dikarin çavdêriyên bi vî awayî pêk bînin. Herwiha ev name girîngiya hebûna rûtînên kontrolkirina sînorê temen tîne bîra xwediyê dikanê.

Kirîna kontrolê ya bîraya gel, tûtin û dermanên bêreçete

AGAHÎ JI BO KESÊN KU BÎRAYA GEL, TÛTIN, Û DERMANAN DIFIROŞIN

Li gorî biryarnameyên di qanûna alkolê (2010:1622), qanûna tûtinê (1993:581) û qanûna li ser bazara hin dermanên bêreçete (2009:730) de şaredarî dikare kirînên kontrolê yên bîraya gel, tûtin û dermanên bêreçete pêk bîne. Di vê nivîsa agahiyê de tê diyar kirin ka ji bo kesên ku bîraya gel, berhemên tûtinê û dermanên bêreçete difiroşin kirîna kontrolê tê çi maneyê.

Kirîna kontrolê çi ye?

Kirîna kontrolê tê wê maneyê ku kesekî ji 18 salan mezintir ku gelekî ciwan xuya dike diceribîne ka ew dikare bêyî ku nasnameya xwe nîşan bide bîraya gel, tûtin an jî derman bikire.

Çima biryarname li ser kirîna kontrolê hene?

Qanûn hatine danîn da ku şaredarî, ku berpirsiyarê çavdêrîkirinê ye, baştir karibe kontrol bike ka kesên ku bîraya gel û berhemên tûtinê difiroşin hay jê hene ka mişteriyan 18 sal dagirtine yan na. Ji ber ku şaredarî berpirsiyarê kontrolê ye heman tişt ji bo dermanan jî lê ye.

JI BÎR NEKE û karkerên xwe agahdar bike ku heye kesên ku kirîna kontrolê dikin serdana dikana we bikin!

Sînorê temen û kontrola temen

Li gorî qanûna alkolê, qanûna tûtinê û qanûna li ser bazara hin dermanên bêreçete mirov nikare bîraya gel, tûtin û dermanên nîkotînê jî di nav de dermanên bêreçete bifiroşe yan jî bide kesên ji 18 salan biçûktir. Kesê ku van berheman bide divê piştrast be ku mişterî 18 sal dagirtine.

Da ku mirov bi awayekî hesan piştrast bibe ka mişterî 18 sal dagirtine divê mirov nasnameya mişterî kontrol bike. Ku firoşker ne piştrast be ku mişterî 18 sal dagirtine ew dikare daxwaza nasnameyê bike. Eger nasname bi mişterî re nebe yan jî ew nexwaze vê nîşan bide wê demê divê ew nikaribe bîraya gel, tûtin an jî derman bikire.

Şaredarî kirîna kontrolê çawa çê dike?

Kirîna kontrolê şêweyekî çavdêrîkirinê ye ku şaredarî dikare bi kar bîne da ku kontrol bike ka kesên ku bîraya gel, tûtin an jî derman perakende difiroşin di dema firotinê de xwe piştrast dikin ku mişterî temenê lazim dagirtiye.

Encama kirîna kontrolê ji bo afirandina diyalogeke di navbera şaredarî û kesên ku van berheman difiroşin de weke bingehekî tê bi kar anîn. Mafê şaredariyê heye ku bêyî agahdarkirinê kirînên kontrolê pêk bîne. Lê divê piştî kirîna kontolê şaredarî di demeke herî kurt de xwediyê dikanê li ser kirîna kontrolê û encama wê agahdar bike.

Şaredarî nikare kirîna kontrolê ji bo tedbîrên îdarî li dijî xwediyê dikanê weke bingeh bikar bîne. Ev tê wê maneyê ku şaredarî bo mînak nikare ji ber encamên kirîna kontrolê firotina xwediyê dikanê qedexe bike.

Li ser broşura bi navê 'kirîna kontolê' ku bi gelek zimanan hatiye çap kirin agahiya zêdetir bixwîne: http://www.folkhalsomyndigheten.se/publicerat-material/publikationer/Kontrollkop

Çima kirîna kontrolê lazim e?

Piraniya kesên ku bîraya gel, tûtin û derman difiroşin ji aliyê agahdarkirina li ser sînorê temen ê 18 salan ve baş in, lê rûtînên kontrola temen dikarin baştir bibin. Kirîna kontrolê ji bo kontrolkirina vê metodeke baş e û ji bo xwediyê dikanan rûtînên xwe baştir bikin û qaîdeya sînorê temen bi cih bînin weke destekekê ye. Bi axaftina piştî kirîna kontrolê şaredarî dikare piştrast be ku xwediyê dikanê û personel qaîdeyên vî warî fêm kirine û herwiha dikare diyar bike ka çima sînorê temen ji bo tûtin, bîraya gel û derman heye. Şaredarî di heman demê de agahiyê dide ka eger mirov daxwaza nasnameyê neke çi rîsk li pêşiya yekî hene. Firotina bîraya gel, tûtin an jî dermanan a ji bo kesên ji 18 salan biçûktir neqanûnî ye û heye kesên ku berheman bifiroşe kesên temen biçûk cezayê pereyî yan jî girtîgehê bistîne.

JI BO AGAHIYA ZÊDETIR TÊKILIYÊ BI ŞAREDARIYA XWE RE DEYNE.

www.folkhalsomyndigheten.se
www.lakemedelsverket.se

Alkol û tûtin tiryakçêker in û ji bo tenduristiyê rîskan diafirînin. Sînorê temen bidestxistina van ji bo ciwanan bisînor dike û ber li destpêkirina alkol û tûtinê ya zû digire. Eger dermanên bêreçete bi awayekî şaş werine bi kar anîn dikarin bibine sedema zerarên mezin. Ji xeynî dermanfiroşan di bazara perakende de ji bo ciwanan îmkana standina şîretên dermanî tuneye.

Loma ji bo baştirkirina tenduristiya gel a li Swêdê û ji bo berlêgirtina bikaranîna şaş a dermanan sînorê temen gelekî girîng e. Divê tu weke xwediyê dikanê firotinê bi awayekî wisa organîze bikî da ku kesên ji 18 salan biçûktir nikaribin van berheman bikirin, ev berpirsiyariya te ye.

Kontrola xwe bi xwe ya xwediyê dikanê

Weke xwediyê dikanê berpirsiyariya kontrola firotina bîraya gel, tûtin û dermanan li ser pişta te ye. Navê vê kontrola xwe bi xwe ye. Kontrola xwe bi xwe tê wê maneyê ku divê programeke kontrola xwe bi xwe were çê kirin û di programê de were diyar kirin ka ji bo qaîdeyên qanûnan werine bi cih anîn xwediyê dikanê û personel çi rûtînan pêk tînin. Yek ji tiştên herî girîng rûtînên ji bo bicihanîna kontrola sînorê temenê 18 salan e. Divê xwediyê dikanê herwiha destek û agahiya ji personel re lazim bide wan da ku ew karibin li gorî biryarnameyên li ser mijarê tev bigerin.

Tu dikarî dosyeyên li ser kontrola xwe bi xwe ya bîraya gel û tûtinê ji şaredariya xwe bistînî yan jî li ser malpera Folkhälsomyndighetenê daxî:

Programa kontrola xwe bi xwe ji bo tûtinê
http://www.folkhalsomyndigheten.se/amnesomraden/tillsyn-och-regelverk/tillsyn-tobak/tillsyn-tobaksforsaljning

Programa kontrola xwe bi xwe ji bo bîraya gel
http://www.folkhalsomyndigheten.se/amnesomraden/tillsyn-och-regelverk/tillsyn-alkohol/folkol

Qaîde û rêberiya ji bo programa kontrola xwe bi xwe ya ji bo bazara dermanên bêreçete li ser malpera Läkemedelsverket hene:
https://www.lakemedelsverket.se/malgrupp/Apotek--handel/Receptfritt-i-affarerna/Regler-och-vagledning